

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988


# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.




Osman Sebrî
1905 - 1993



*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar (106)* *Sal 20 Rêbendan 2015z - 2626k* *Buha (50)L.S*


## Carek din

## NEWROZ Bi xwendevanên xwe re ye

Desteya sernivîser/**Rêberê Silîvî**



Ev derdora çar salan e ku welatê me Sûriyê di rewşeke zor taybet û awarte de dijî, navnîşana wê şer, pevçûn, kuştin û golên xwîna mirovan û wêrankirina gund û bajaran e. Li hêlekê, bi hovîtî û şêweyekî kesnedî, li ber çavên şaristaniya cîhana modern û demokrat, termên zarok, jin, pîr û kalên xelkên Sûriyê bi sedema bombebarankirina top û bermîlên teqîner ên rijêma har a destbixwîn, di bin kavilên wêrankirî de têne veşartin. Li hêla din jî, gelek mirovên bê sûc û bê guneh ên ji vî şêweyê mirinê reha dibin, li ser destê çeteyên terorist rastî recimkirin û serjêkirinê tên!. Ji bilî koçberbûna dora nîvê nişteciyên Sûriyê li hundir û derveyî welêt.

Di vê rewşa têkelhev û aloz de ku dengê gule û qurşînan dengê herî bilind û berz e, û dengê zanîn, hişmendî û aştiyê nayê bihîstin. Mixabin di vê çarçewê de dengê weşana we NEWROZ jî piştî derçûna hejmara (104-105)an a Êlûna 2012an hate rawestan û nema karîbû çanda nûjen a Kurdewarî û mirovheziyê biweşîne.

Mixabin ku ji mêj ve û îro jî, rêz û rûmeta qels û sêfîlan di civakê de nîne, tenê aliyên xurt û bi hêz dikarin serfiraz û payebilind bijîn. Piraniya dewletên Ewropayê dewlemend û zengîn in, azad û xwedî al in, xwedî artêş û leşker in û di Yekîtiya Netewan de jî endam in… Lê ew têgihiştin ku eger ew rêzên xwe nedin ser hev, dewletên mezin dê wan daqurtînin. .............. 11

## Dagîrkirina KOBANÊ Û Pêlanên Navdewletî

**Rozad Elî**

Ji navîna meha Rezbera(Êlûn) sala 2014an de, çeteyên DAIŞê hêrişeke mezin birin ser navça Kobanê û di encamê de tevahiya gundên wê dagîr kirin, bajarê Kobanê hat dorpêçkirin, û bi sed hezaran niştecihên navçê jî neçar bûn mal û arzûyên xwe bihêlin û bi paş sînorê Tirkiyê kevin. .............. 3

## Ragihandina ji civata fere Ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê

Li dawiya meha Berfenbar[berçile] 2014an, komîta rêvebir a Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, civata xwe ya fere li dar xist. Nûnerên hemî navçeyên rêxistinê li hundur û li derve lê beşdar bûn. Tê de berztirîn babet û pirsên ku hene bi berpirsyarî û aşkere hatin gengeşekirin. .............. 10

## Heval Kemal Henan! Şopa we berdewam e!

**Dr.M.Elî**

**L**i bîra me ye, ku hevalê me yê hêja û sernivîserê Rojnama me Newroz pakrewan Kemal Henan li roja 30.01.2013an, li bajarê Helebê, li ber mala xwe, bi qurşîna kesine bêbext jiyana xwe ji dest da. .............. 2

**Heval Kemal …. Dûmahîk**



Gorbihuştê nemir Kemal, li sala 1953an li gundê Tilifê ji navça Efrînê jidayîk bûye. wî xwendina xwe li Efrîn û li Helebê bi dawî kiriye.

Heval Kemal ji ciwaniya xwe de di nava refên rêxistinên siyasî yên Kurdî de kar dikir, wî doza gelê xwe weke erkeke netewî û mirovanî danîbû ser milê xwe, jê re dilsozekî pêbend bû û bê westan û rawestan û bi hemî kanînên xwe ji bo bidestxistina mafê gelê xwe dixebitî.

Heval kemal ji kadroyên li pêş bû di nava rêzên tevgera Kurdî de, û demeke dirêj endamê serkirdayetiya Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûryê (PYDKs) bû. Armanca wî ya sereke di jiyana wî ya siyasî de pêkanîna azadî, wekhevî û dadmendiyê bû. Wî li gel hevalên xwe doza jiyaneke layiqê mirovê sûrî dikir û ra dawiya jiyana xwe ji wan armancên xwe yên nirxbuha re pêbendekî kûrbawer û pêdar bû.

Ji hêleke din de, heval û pakrewanê me yê hêja, mirovekî sincîpak û mirovhez bû, ji dost û hevalên xwe re pir dilsoz bû, û rêzdariya wan pir digirt. Ji ber salix û sinciyên wî yên payebilind, wî cihekî bilind di nava dost û naskiriyên xwe de û li ba hevalên partiya xwe û gelê xwe digirt, û bi hişmendî, zanîn, bawerî, dilsozî, taqe û sinciyên xwe yên bilind dihat nasîn, wê lomê jî, ew ji wan hevalan re wek vegergeheke bawerdar û pir rastgo bû.

Ji bilî wan salix û sinciyan, mamoste Kemal hezkir û bendewarekî zîrek û dilsoz bû ji zimanê kurdî re. Digel ku wî bi zimanê Erebî jî baş dinivîsand, lê hezkirina wî ji zimanê Kurdî re di pileya bilind de bû. Wî ji destpêka xebata xwe de li gel hevalên xwe giringiyeke zor berçav dida zimanê Kurdî, pê dixwend, dinivîsand û dida fêrkirin. Wekî ku hevalên wî dizanin, ew ji kesên destpêkê bû ku li salên heftêyî ji sedsala bîstan zimanê Kurdî fêr dikir, çi li Efrînê û çi li Helebê, û wek mamosteyê zimên dihat nasîn.

Di wî warî de, wî li sala 2006an li gel hezkiriyên zimanê Kurdî, Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî(SFPZK) ava kirin, roleke wî ye giring di rêvebirina wê de hebû û ra roja xwe ya dawîn di nava SFPZK de endamekî xemxwar û mamostakî çalak bû. Û dema ku li sala 1995an pêşniyara derxistina belavokeke bi zimanê Kurdî hate kirin, mamoste Kemal, wek serkirdeyekî partiya (PYDKs), jê re piştgirekî dilgerm bû, û herwiha rojnama NEWROZê li Buhara wê salê ronî dît û dest bi weşana xwe kir, û ew bi xwe jî bû endamê desteya wê ya sernivîser û ra roja goçkirina xwe li ber serê wê bû, û ji hejmara Newrozê ya yekê de (Nîsana 1995an) û ra hejmara hevbeş /104-105an/, barê giran li ser milê wî bû, ew jî li gel hevalên xwe bi karûbarên derxistina wê radibû, û xwe jê re wek berpirsyar, tîprêz, derhêner, nivîskar, lêvegervan, çapker û belavker jî didîtû erşîfa wê jî diparast, ji bilî ku di her hejmareke Newrozê de, nivîsarên wî yên ji babetên têvel hebûn, wek gotarên siyasî, lêkolîn, wêje...û hwd. Û bi saya pêwendiyên fere yên pakrewan Kemal, têkliya Newrozê bi gelek nivîskaran re li welêt û li derveyê welêt hatin girêdan, wan tê de dinivîsand û dibûn xwendevanên wê yên berdewam.

Wek wefadarî ji heval û sernivîserê rojnama Newroz nemirê hêja Kemal Henan û xebata wî û hevalên nemir mîna Edîb Îbrahîm û Mistefa `Ellaş endamên desteya sernivîser re, û pêbendiya hevalên wî bi zimanê me yê şêrîn re, û dilsozî ji nivîskar, xwendevan û hezkiriyên rojnama Newrozê re, rêbertiya partiya PYDKs pêwîst dît ku rojnama "Newroz" serkînûve were weşandin û bi rêbaz û xemleke nû dakeve meydana medya Kurdî.

**Dagîrkirina KOBANÊ … Dûmahîk**




Di hêrişa hovane de, keç û xortên Kurd ên leheng bi qehremanî bergirî li têrorîstan kirin û li ber xwe dan, lê hejmara çeteyan a mezin û çekên giran, li gel taybetiya xaknîgarî ya navça Kobanê, Yekîneyên Parastina Gel neçar kirin ku bajarê Kobanê bikin bereya şerê dawîn bi têroran re.

Ji bo naskirina rastiya sedemên ev bobelata giran, mera kane, bê erên, destê xwe dirêj hin alî û dewletên derdorê bike, û bibêje ku destê wan di ew pêlana piralî de li serê gelê Kurd li Sûryê heye.

Li gor şiroveyên medyayê û çavdêrên siyasî, ew dest û aliyên ku di paş hêrişa DAIŞê li ser Kobanê de ne û sûdê jê werdigirin, wê ev bin:

**Dewlta Tirkiyê(D.T)**:

Helwesta Turkiyê ya neyînî li derbarê pirsa gelê Kurd baş naskirî ye. Roja îro jî dibîne ku, Kurd li ber çavên wê, bingeha sîstemeke xweser dadimezrînin û hêzên çekdar ava dikin?! Dewleta Tirk vê guhertinê wek guhertineke pir metirsîdar li ser ewlehiya xwe ya netewî dibîne. Herwiha ew dibîne ku ew tebatî û hêminiya ku ji serdema dewleta Osmanî de bi darê zorê li ser gelê Kurd hatiye çespandin, roja îro bi destê Gelê Kurd li Rojava tê hejandin!. Loma jî, û li gora siyaseta D.T ya niha, ew amade ye ku destê xwe bide DAIŞê, û qiyametê jî bi serê Kurdan de rake!!.

**Destlata Sûryê:**

Navnîşanên siyasetên Partiya Be'is li Sûryê û Êraqê di tenga gelê Kurd re herdem înkarkirin, pişaftin û tunekirin bû. P.Be'is dibêje, ku Kurdên Sûryê ji paş sînorê Tirkiyê hatine Bakurê Sûryê. Loma jî, dema ku rêxistina DAIŞ navçeke Kurdî li Sûryê ji Kurdan vala dike, ew siyaseta Be'isiyên şoven bicih tîne û kurdan "vedigerîne cihê ku jê hatine!!". Yanê, mirov kane bê erêna bêje, ku destê destlata Sûryê di hêrişa li ser Kobaniyê de diyar e û bi têvedana wê ye. Baş li bîra me ye, ku berî hêrişa DAIŞ li ser Kobanê bi çend heftan, çawa sazûmana Sûrî çekên xwe yên giran li tîma (firqa) 17an li Reqayê û Lîwaê 93an li 'Ên 'Arûsê ji DAIŞê re hîştin, û ew çek bi xwe di hêrişa DAIŞê de bi kar hatin.

**Şovenîstên Ereb:**

Gelek kom û kesayetiyên siyasî di nava rêxistinên Hevbana[iitîlaf] Niştimanî ya Sûrî de hene, ji bingeha xwe ya ramyarî û bîrdozî de şovenîstên hişkbawer in, wan ji ava raman û bîrdoza Be'sîtî û 'Urûbetiyê vexwarine û li ser mezin bûne. Erê ew niha xwe dozdarên azadî û demokrasiyê dibînin, lê gelek ji wan hîn dîlbendên nêrînên şoven in, û naxwezin mafekî Kurdan li Sûrya pêşerojê pêk were. Ji bilî ku helwesta wan a neyînî sebaret rêveberiya xweser û doza Kurdî li Sûryê xuya ye, loma jî ewê ji hêrişa DAIŞê li ser Kobanê û encamên wê razî bin, û di dilê xwe de pê re bin jî.

Li ber roniya van metirsiyeke, mirov tê digihê ku dijminên gelê kurd, kanin di nava hemî nîr û mercan de bibin yek, û amade ne li hev bikin û gotina ((dijminê dijmin dost e)) pêk wînin.

Li vir ev pirsa rewa tê holê: Em dijminên xwe nas dikin, û pêlanên wan jî tê digihên, lê kanî amadekariyên me yên gelêrî û siyasî ji bo parastina gelê xwe û doza xwe çi bûn û çi ne? Em baş dizanin ku eger rewş wiha here, ewê xetereke dîrokî û stratîçî li ser gelê Kurd li Sûryê çêke. Ji ber wê jî, hêviya gelê me ya dawîn di "Levkirina Duhokê" de ye, di van rewşên dijwar û pir nazik de, û ji bo parastina destkeftiyê gelê Kurd û biserketina doza wî, pêdviyeke mezin bi yekîtî û levkirinê heye. Lewre, kî keleman dîne pêşiya levkirina Duhokê û yekîtiya gelê Kurd neparêze, ewê li dermafê gelê Kurd bibe gunehkarê dîrokê û bernifirê gelê xwe ta roja qiyametê.

# Bozrewanên Gel!

**Mihemed Qere Hesen**

Rojekê mirovekî beranê xwe diçêrand daku qelew bibe û li cejna qurbanê şerjêke. Çavê Ehrîman li berên ket, bi ser xwe de pênijî ku ewê çawa berên ji xudiyê wî bistîne. Wî çû hespekî pufêkirî ku rind û çeleng xuya dibû anî. Bi serê hêsp girt, û mîna mirovekî rêwî xwe ji xudiyê berên re da nasîn. Piştî silavê û lihevpirsînê, Ehrîman jê re got: Destbira tu beranê xwe bi hespê min naguhêrî? Mirov şêt ma! Çawa tuyê hespê xwe yê çeleg bi beranê min biguherî!? Rast e beranê min qelew û baş e, lê ne bi qaserî hespê te ye.

Ehrêmên got: Destbira, ez pê qayil im, çima tu na!? Li dawiyê li hev kirin û bi hev guhêrîn.

Ehrîmên bi serê beranê xwe girt û bi rê de çû, mirov jî bi hevsarê hespê xwe girt û bi dilşahî li mal vegerî. Dema ku gihêşte mal, hevsar bi koka darê girêda û bi lez çû bang gundiyan kir, daku hespê xwe şanî wan bike. Gava gundî li dora hêsp kom bûn, dîtin ku ew hêdî-hêdî biçûk dibe, û herwiha dagerî ta bû mişk û kete qula dîwêr, temaşevan li wê bûyerê mat diman!.

Di dilê gelê Kurd de bû li Sûriyê, ku tevgera xwe di rojên reş de wê hespekî pêbawer be, daku lê siwar be û kani be pê bigihê cîhaneke azad.

Li destpêka pêvajoya şoreşa gelê sûrî de, bizava Kurd karibû xwe kom ser hev bikira û du çarçewên siyasî ava bikirana "Encûmana Niştîmanî" û "Encûmana Gelê Rojava". Lê wan herduyan li gorî daxwaz gelê Kurd yekbûnek pêk nanîn. Ji dêvla wê, gizgizî û nakokiyên di navber herdu aliyan de tentêleke[reşwek] ne xwazeyî di civaka kurdî de çêdikir û dijîtiyek bê havil dihate kirin. Wê rewşa bê sûde hêşt ku berêz serokê kurdistana başûr herdu seryan vexwîne Hewlêrê û girêbesta yekê were morkirin. Lê mixabin herdu aliyan ji mor û erêkirina xwe re giramgîrî nekirin, her yekî serê xwe bi rexekê de kişand. Dijîtiya xwe li kolanê germ kirin û her yekî xwe di paş raghandin, piropagande û dirûşmên xwe de veşart û xwe xwedî rastiyê didîtin û yên din jî gunehkar dikir. Lê mixabin rêjeya rastiyê ne li hêlek bû û şaşî li ba herduyan hebûn, ji ber ku berjewendiya gelê Kurd di lihevkirinê de ye, ne di dubendiyê de ye. kiryarên wan hêşt ku gel li alîkî raweste û ew li aliyê din raweste û roj bi roj hêvî di dil de biqerime. Vê rewşa aloz hêşt ku, berêz Mesuid Berzanî wan carek din bibe Hewlêrê û girêbesta diduyan di navbera wan de mor bikin. Vê girêbestê carek din hêvî di dilê gel de bişkuvandin.

Lihevkirin di jiyanê de bi xwe şana tebatî, pêşketin û kêmwestiyê ye. Herdu girêbestên Hewlêrê tevî kêmkasî û şaşiyên wan bi ci hatibana wê ji niha baştir ba. Hin ji kêmasî û şaşiyan, hewildana ku para partîkî bi ser para partîkî din bixîne. Gava dest bi hevpişkên nîv bi nîv kirin di navbera herdu encûmanan de, ew bi xwe şaşiye, wê hêşt ku her partiyek bi xwe re bibêje ez partiya mezin im, divê para min ji yê din pirtir be. Ji ber wê ez xwe di hundirê mezinahiyê de dibînim, mezinahî jî xwe di hundirê rastî û raweyê de dibîne. Ango ew xwe xwediyê pirmaf dibîne û yên din jî kêmaf dibne. Ev bingeha han ji henasa ezîtiya kesane û partîtiya jar,… tê. Ton karên weha ziyana mezin digihîne heyîna Kurd wek maf û zemîn…Vê jî hêşt ku hin partî xwe mezin û xwedî pirmaf bibînin û nûneran di çarçewan de pir bixwazin.

Gelo mirov ji xwe dipirse, daniştok û ez - ezî ji êrişên rêxistnên tundrewan û kuştarên ew bi serê me tînin mezintir in? Di vê dem û tentêlê de kîjan pêwîst e? Ma gelo partî, serok û kes di berjewendiya gelan de ne, lê gel dibe qurban kes, serok û partiyan û vê wan nikarin bijîn!? Wek hatî zanîn, ku gel û netewan şaristanî û dîrok çêkirine û nivîsandine, ne gava serokek ji dewletekê an partekî re tê hilbijartin, divê milet jê re ezben û perestvan be. Lê di welatên paşmayî de li gor zagonên demokrasiyê tu serok nehatine hilbijartin. Vê jî siya xwe li mêjiyê partiyên me kiriye. Ev mêjî û rewşenbîrî şanên ezîtî, jar, dîktetorî û serdestiya tevane ne, xwe li şûna demokrasiyê û wekheviyê berz dike.

Îro di avakirina lêvegra rêzanî de derdekî weha dîsa xwe xuyan dike, ew jî nûnerên ENKSê li herêma Cezîrênê tenê tên hilbijartin. Ger nîr û rewş çi be jî gerek e mafê du beşan ji kurdistana Sûriyê netê xwerin. …………… ⓫

# Guhartinên mezin û dîtinên nû

**Dr. Leheng Mihemed**

Di pêşî de ez komîta derhênana rojnama Newrozê ya ku ew ji nû ve derxiste holê spas dikim û pêşketinê ji wê re dixwazim.

Bi boneya nûjenkirina belavkirina Newroza ku li ber dilê me buha, dixwazim pêşerojek cuda jê re bibînim, û bibe nimûnek serkeftî ji ragihandina Kurdî re li tevayî Kurdistanê.

Roj li dû rojê em rastî guhartinên mezin tên, çi di aliyê siyasî de, çi civakî, çi li seranserî gozemînê di warên tevgera kapîtalîzmê, dîmokrasiyê û parastina mafên mirov û miletan, û çi li Rojhilata navîn piştî tevgera Buhara Erebî û tiştên bi xwe re anîne. Ya me Kurd jî mîna her miletekî di vê herêmê de, guhartinin dîrokî û rîçalî di jiyana me de jî çêdibin. Niha, tiştê sereke ku mirov dibîne, miletê me cihê xwe di nexşeya siyasî ya navdewletî de bi giranî digire- bi taybetî jî li Başûr û Rojava, û xûya dibe- kê xwestî yan nexwestî- cihê doza Kurdan balkêştir dibe û bi kûranî tê gengeşekirin. Mijara me ne em zanibin wê çi bibe, yan jî encam wê çi bin, armanca me em bêjin ku em asteke nû di jiyana xwe de dijîn û doza me ji vir û wêde wê qet neyê bincilkirin.

Lê ev rewş û merc, ramaneke nû li ser me ferz dike. Di vê çarçewê de, tevgerek mezin di her aliyekî de ji me tê xwestin, ji aliyên siyasî, ragihandin, civaka sîvîl û hemû cureyên şaristaniyê. Tiştê ku rojnamek wek Newrozê bi vê tevgera girîng ve girê dide, ew e ku Newroz him alavek ragihandinê ye û him jî bingehek wê pak û zanyarî di warê nivîsandina Kurdî de heye. Ji ber vê jî ew kane bi du stûbariyan rabe :

-Bi karûbarê Ragihandina kurdî ya ku bi zimanê dê belav dibe rabe, ta ku bibe zimanê fikir û ramanê.

-Bi rola nêzîkhevkirina zaravên Kurdî û pêkanîna zimanekî stender rabe.

Em baş karin binêrin, çawa ragihandin bandora xwe li ser miletan heye û hikariya alavên wê çi ne?. Kenalek Televizyonê ku hinekî ekonomîka wê baş be, û bi zimanekî zelal bi milet re baxêve, dikare bi rola destlatekê li ser raya giştî bilîze. Mixabin ta niha rewşa ragihandina Kurdî di astek ne mîna ragihandina cîhanê de ye. Bandora partîtiyê li ser pir e, digel ku ew jî ne astengeke mizin e, lê weşandin bi rengekî partîtî aşkere û ne profêşinal dibe, û li kêlekê nehemereng e.

Li gor tiştên me xûyakirine, ta niha ragihandinek ku dikare bi tevaya xelkê Kurdistanê re baxive tuneye, sedema wê ya bingehîn jî tunebûna yekzaravekê di nav xelkê Kurdistanê de ye, ew jî divê xema zimanzan û ragihandinê be.

Em vegerin ser Newrozê, ew wek rojname beşek ji ragîhandinê ye, balkêşiya wê ew e ku yên li ser dixebitin mijûldarên zimên in. Li vir mirov ji xwe dipirse, çima di pêşerojê de ewê nebe rojnameke rojane, û her sibehekê li hemû bajarên Kurdistanê netê belavkirin? Çima evê nebe armancek dûr û dirêj ji komîta Newrozê re?.

Eger em ji pirojeyên wisa re bixebitin, ew bi xwe gaveke li ser pêkanîna Kurdistana me ya ku bûye xewna me Kurdan. Bila kesên ku siyasetê dikin, bifkirin çawa sînorên siyasî ji nav xaka Kurdistanê rakin, û bila rewşenbîr jî bifkirin çawa sînorên ne siyasî ji navbera miletê Kurd rakin.

## Pîrozkirina qehremanan

Bi boneya weşandina Rojnama Newrozê piştî demek ji rawestandinê, ew berxwedana hêzên Pêşmerge, YPG, YPJ û hemî hêzên din ên li hember Da'îşê berevaniyê dikin pîroz û silav dike. Herweha ew xwe wek çek jî ji bo serkeftina şervanên me û rûxandina hêzên tundrew nîşan dide.

## Civîna fere ya

## Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî

Li 19.12.2014 an, Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî (Şaxa Efrînê) civîna xwe ya fere û nîvsalane li dar xist. Li pêşî, kêlîkek bêdeng li ser giyana pakrewanên Kurd û Kurdistanê hate rawestin. Paşê li ser rewşa Saziyê bi berpirsiyarî hate seknandin û di encama gengeşkirinê de, civat giha van pêşinyar û biryaran :

Pêwîste govdeya Saziyê bê parastin .

Gerek e li her gundekî ku mamosteyên Saziyê tê de hene, maleke zimên lê were vekirin û ew bibe navendeke belavkirina fêrkirina zimên û pirtûkên Kurdî.

Avakirina komîteyên pisporiyê û dest bi lidarxistina şevbuhêrk, semînar û çalakiyên rewşenbîrî, zimanewî, çîrok, helbest ... H.W.D ên bi zimanê Kurdî bike. Li dawiyê sipasiya beşdaran hate kirin.

## li Efrînê şanoyeke zarokan



-Li roja 27-12-2014 û li ser şanoye navenda çandeyê ya bajarê Efrînê, Sazîya Almelak ye Xêrxaz şanoyek bi nave (Perçikên[sezaya] Jiyanê) li dar xist, tê de li ser şerê ku li Sûriyê dibe û encamên wê ji belavkirina kûştin, wêran, talan û zarokên ku bê bav û dayîk mane hat lîstin. Di beşê dûyem de jî, zarokan nameyek ji ew kesên ku destê wan di vî şerî de heye şand, daku şer rawestînin û bihêlin zarok jiyana xwe bi awakî aştîyane û aram berdewam bikin. Li dawîyê şanoyê, pirs ji zarokên beşdar hatin kirin û hin dîyarî li wan hat belav kirin

## Semînarek

-Li 26-12-2014 û di navenda Partîya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd de li bajarê Efrînê, bi beşdariya hejmarek ji endamên partiyê, sîmînarek li ser alavên raghandinê û çawa ku mirov bi wê re bixebite, hat lidarxistin. Tê da mamoste Merwan Berekat bi awakî taybet li ser ``awayên têkildariyên civakî`` bi taybat jî ``facebookê`` axifî, aliyên wê yên posêtîv û yin nêgetîv û çawa gereke mirov bi awakî durust bi vê re têkiliyê bike, û ji alîkî din li ser malperên nûçeyan întirnêtê hat axaftin, tê de diyar kir kû piraniya wan malperan girêdayî kesên ku piştgiriyên aborî jê re bêşkeş dike, lê dimîne ku karê wan di derxistina rastîyan de dibe sedema serkeftina yan binkeftina wan malperan. Piştî wê, çend ciwanên amade çend pirsên xwe kirin û hûn pêşinyar jî dan.

## Spasî

Weke hersal, îsal jî Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê bi bareya[hemla] salane ya camêriyê di nav gelê xwe de rabû û piştî bareya xwe bi dawî kir, ew spasiya hemî kesên ku alîkarî dane dike, herweha ji hemî gelê xwe yê Kurd hêvî dike, ku ji bo doza xwe ya dadmend û rewa hertim camêr û fedekar bin.

## Namak ji Kobanê

**Arif Hiso**



Hêzên çete; tundrewên xwedênenas û hovane bi hemî çekên giran êrêşî Kobaniya me ya delal kirin, kesên sivîl ji niştecihên bajar û gundên Kobanê neçar bûn, ku hemû tiştên xwe li şûn xwe bihêlin û berê xwe bidin sînorê bakurê Kurdistanê, û nexasim Sirûc, Bîrecik û Urfa… Herweha miletê Kobanê li her derê bû penaber û roj bi roj çîrokên penaberiyê yên pirêş zêde dibin.

Rast e, hemû kurd û li seranserî kurdistanê bi erkên xwe yên kurdewarî dibin û her kesekî li gor kanebûna xwe alîkariya xelkê Kobanê kirin, bêguman ew yek jî ji nîşanên serkeftinê ne, lê nîşan mezintirîn ew e, ku hêzên Kurdî YPG, YPJ û PÊŞMERGAN, ta roja îro şer û berevaniyeke dîrokî di Kobanê de dikin, û roj bi roj hêzên çeteyên Dayîş li ser axa Kobanê tên vegevizandin û paş de direvin.

Lê mixabin partiyên tevgera siyasî ya Kurdî, ji bo Kobanê bê rol in, ew tenê carina li hev rûdinin, û ew rûniştin jî bê encam in, eger encam hebin jî, ew şer û nakokî ne.

Bêguman Kobanê bi serdikeve û ew serkeftin jî ne dreng e, lê eger rewşa partiyên kurdî wisa bimîne, ne tenê baweriya gel bi wan dê hêdî hêdî lawaz bibe, lê belkî tewir nemîne jî.

Em xelkê Kobanê bang dikin û dibêjin: Bijî berxwedan û berevaniya YPG û Pêşmergan, spas ji bo her kesê ku ji Kobaniyan re bûne alîkar, em hêvî dikin, ku partiyên Tevgera Kurdî jî bi dilekî pak bibin yek û tiştekî ji Kobanê re bikin, ta em ji wan re jî bêjin: Spas.

## Zimanzanê Kurd Emîrxan goça dawîn kir




Piştî berxwedaneke dirêj bi nexwaşiyê re, li roja Înê 12.12.2014an Dr. Mistefa Emîr (Emîrxan) li bajarê Stembûlê jiyana xwe ji dest da û çû ser qedera xwe. Bi goçkirina wî, zimanzenekî çalak û mirovekî zimanhez ji destê me çû.

Diktor Emîrxan li sala 1949an li Gundê Xaziyana Jorîn ku bi ser devera Mabeta- Efrînê ve ye jidayîk bûye. Xwendina xwe ya seretayî li dibistana Gundê Sariya ku dora 4/km li bakurê gundê wî ye qedandiye. Xwendina xwe ya amadeyî û diwemîn jî li bajarên Efrînê û Hêrimê bidest xistiye. Pişt re li sala 1973an berê xwe daye Dewleta Nemsa, li wir bicih bûye û xwendina bijîşkiyê li zanîngeha Viyêna xwendiye, lê ji ber mêldariya wî bi ser wêje û zimên de, ew bi ser kolîca Xaknîgariyê de çûye.

Dr. Mîrxan ferhengeke Almanî-Kurdî û yek Kurdî-Almanî amade kirin û li sala 1991ê belav kirin, dora 44/hezar bêje di wande hene.

Wî ferhengeke Erebî-Kurdî jî amade kir, ew jî ji 75/hezar bêje pêk tê û li sala 1997an çap bûye.

Mîrxan dîroka olan baş dixwend û tê de kûr diçû, loma jî wî Pirtûka Pîroz "Incîl- Serdema Nû" wergerandiye zimanê Kurdî û li sala 2002an belav kiriye.

Hêja ye em bêjin, ku pirtûkên wî ji hêla zanîngeha Viyêne de dihatin pesendkirin û belavkirin.

Dr. Mîrxan ji hêla dîroknivîsên Ewrupî de jî baş naskirî bû û di warên dîroka Kurdî, ziman û olan de kesayetiyeke çalak û jîr bû. Wî jiyana xwe ji bo vejandin ziman û wêjeya Kurdî terxan dibû.

Bi navê rojnama Newroz em serê mal û malbata wî û gelê Kurd xweş dikin. Ziyana wan ziyana me hemiyan e.

## Ey derya

**Merwa**

Wêneya heyvê li ser rûyê te bû

**Ey derya**

Li keştiya dil siwar bû

Û dûr reviya ey derya

Xwazî…

Qermîçikên lêvên te bihevdim

Li giravên sêwî çêrokên te tevdim

Li dergûşa sîngê te

Gul û sosinan dixwekim

Ji herdu lingên te

Ustiriyan hilkim

**Ey derya**

Bi xumxuma ewran

Te ji xew rakim

Kurpisiya di guhên te de şiyarkim

Ji kenarên te

Kefkopikê berefkim

Xanîkî qûmê li hemberan bigrim

**Ey derya**

Li sencên bajarên te bixwe

Nameyên şil û şîn bixwînim

Pêlan peylikan bihûnim

Ji ber neynûkên xemê

Te birevînim….

**Ey derya**

Ji benikên birûskê Landikê

dagirim

Konek baran bi ser te de

Vegirim…

**Ey derya**

Em her du bi kula kûr in

Ji perav û kenara dûr in

Were

Hemêza şevên hev bidizin

Li sîya çûkiyê têr bilîzin

Ez çi bikim

Dilêmin dilekî ne wek dila ye

Tu jî deryake ne wek derya yî

**Ey derya**

**Ey derya**

## CEJNA XWÎNÊ Û HÊSTÊRAN

**Dêrsim Memo**



Yan.. tirs û mirin
Dor te dipêçin…
Loman; ji te dikin…
Hêstir; bi şewat
Henarkên rûyê te
Dikolin….
Tu gîyanê xwe
Ji kalên… dikşînî
Kul û kavilên xwe
Kom ser hev dikî
Bîr û hestên xwe ..
Neçar.. neçar daduqurtînî…
Dunyê.. li bejna xwe dipêçî..
Bê hiş û bîrî.. berve
Mirina xwe…. diçî
Li hember girêka gunehê
Yekem…
Şêt û mêt dimînî
Bi kel û heyecan.. tu
Perçê laşê hozana xwe
Berhev dikî
Di " Mihraba" … mişextiyê de
Di holika biyaniyê de
Tu nimêja xwe dikî
Cixara şikestî, vemirî
Dîsa pêdixînî
gornekê û du kêlikan
Ji xwe re amade dikî…..

# NE TENÊ NÎVÊ CIVAKÊ YE

# JIN.. JIYAN BIXWE YE

**Merwan Berekat**

Jin hêvan, berdewamî, nîvê dîrokê û demsala jiyana mirovahiyê ya xunavî û xemlebihuştî ye.

Bila Kesek nebêje, ev çi seyr e, û di delavên şêt û mêtiyê de nedele, ne jî mejiyê xwe bi sertî bixrîne, dema em bibêjin: Jin ne tenê ( Nîvê civakê) û hevjiyana mêr e, lê belê piştî ba, av, ax û êgir, ew merca berdewamiya jiyanê ya pêncemîn e jî.

Jiyana bê jinê beyabaneke bê mercên zîldanê û çiyakî rûûût; rût e.

Belê… Jin yek ji bingehên geşedana civakê ya sereke ye, û civaka ku jinê bavêje kenarên jiyanê, ew civakeke payîzî, pûç û nîvstewr e.

Di destpêka dîroka mirovahiyê de û ta roja îro, jin dibistan û akademiya yekemîn e, ku bi dilsozî nifşan fêrî mirovatî, sinc û jiyanperweriyê dike.

Wekî çawa kanî û robarên zelal li hawîrdora dirêjiya herikandina xwe kulîk, nêrgiz û qurnefîlan geş dikin, û bîna xweş di wan de berdidin, her weha jin jî, şahîziya dilşadî, dilovanî û perwerdekareke rastgo û bêhempa ye. Tabloya kar û xebatê û di hemû warên jiyanê de, bê jinê tabloyeke kêmreng û nelihevhatî ye.

Jin evînzê û yar e. Ma gelo eger jin tuneba evînê heba..? Eger ne ji Zînê ba, bêguman destaneya Mem û Zînê wê tuneba, û Ehmedê Xanî jî, dê nebûya mîrê helbesta Kurdî.

Feqê Teyran, ta di kefecana mirinê de jî bang dikir: Lêêê Sînemê..! Eger ne ji Sînemê ba, ma gelo navê Miksê wê derbasî wêjeya Kurdî ba ?

Jin diya şandiyar ( pêxember ), zanyar, gewremirov û pakrewanan e.

Belê; ew dê, xwîşk, met, hevjîn û keç e. Miletê ku pend û dîwaran li pêş rola jinê ava bike û mejînêr bijî, ew miletekî nêremê ye, ne dizê û ne jî vedizê.

*Heylana Rihayê, diya Qistentînê Romayê bû*

*Gewrejineke mirovperwer û azadîhez bû*

*Azad kirin Xiristiyan û perestgeh avabûn.*

Dema zarok dêşe, birçî dibe yan jî xwesteke wî hebe, ew gazincên xwe datîne ber destên diya xwe….. Dema mirovek nexweş dibe û azar zora wî dibin, ew bang dike û dibêje aaax dayê……. Dema ciwanek bi derdê evînê dikeve, ew bixçika wî derdî berî her kesekî din, li pêş diya xwe, yan jî xwîşka xwe vedike….. Dema mêr ji kar vedigere mal û eger zarokine wî û diya wan ne li mal bin, pirsa yekem li hevjîna xwe dipirse, û pişt re pirsa zarokên ne li mal dike, û belkî carina wan ji bîr jî dike…… Dema şahiyek tê lidarxistin tenê jin lîlîyan dikin, û wê şahiyê geş dikin…… Dema mêr diçe ser dilovaniya Xwedê, yên pirtirîn li ber dikevin, û ji dil de digrîn ne bav, bira, ap û xal in, lê belê ew dê, hevjîn, keç, xwîşk, met û xaltîk in….. Yên pirtirîn serdana gorên dê, bav, hevjîn û zarokên xwe dikin jin in, belê; jin in.

Lê mixabin û sed carî mixabinn, dema ku di hin civakan de doza mafê jinê tê kirin, çavsor û mejînêr pêkolên nêrîtiyeke ne rewa dikin, û carina jî, kêmhişiya xwe der dikin û dibêjin: " Jin tenê ji bo zarok û karûbarên malê ye " !!?

Lê dema rastiya jinê deng bi xwe xîne, jineke zana, wê wan hemiyan tî di delavên Ferêt û Dicla re tî derbaske, û tî jî vegerîne.

Belê; birakino..! Belê. Dema vîn û pêdariya jinê derdikeve holê qad dihejin, lehengî bixwe li xwe vedigere û navnîşanine nû li dîrok û ferhenga xwe ya dêrîn zêde dike.

Belê.. Ez ne hêvî û nigaşan dihûnim, û ne jî, ji dervî sînorên cîhanê rengên tabloya rastiya jinê kom û pars dikim, lê rojane em bi nûçyên vîn û pêdariya jina Kurd li kolan û çeperê Kobaniya serbilind şanaz, dilgerm û serbilind dibin, û bi zimanê pênûsa xwe rastiya wê dibêjim.

**Ragihandina ji civata fere …… Dûmahîk**

Di serî de, ji bo piştgiriya bi law û keçên Kobaniyê re û nirxandina fedekariyên mezin ên Yekîneyên Parastina Gel û rola wan a berçav di bergîriya li dijî terora rêxistina El Dewlê (Da'iş) û êrîşên wê yên li dijî herêma Kobaniyê ya Kurd a Sûrî, ji bo wan tiştan biryara beşdaran ew bû, ku civata fere bi Kobaniyê were binavkirina.

Û piştî gengeşekirina rewşa kambax li welêt, civatê tekez kir, ku hemî serpêhatî û kirîzên ku li Sûriyê peyda dibin, rijîma tundûtûj a setemkar di ber de berpirsyar e, ji ber ku wê tenê çareriya ewlehî û leşkerî ji bo çareserkirina rewşê vebjart. Ew yek jî bû sedema kuştin, birînkirin û seqetkirina bi sedhezaran kes, û penaberkirin û koçberkirina bi milyonan kesên Sûriyê. Daxwaza destlatê ew bû, ku di wê karnavê de, hêzên Islama siyasî yên herî tundrew û terorîst bêne geşkirin, bandora wan fere bibe û hêz û rola wan her biçin zêdetir bibin. Bi taybetî jî, piştî ku Dewleta Xîlafê li Mûsilê ragihandin, û bi tevlêbûna çekdaran ji Îraq û Sûriyê, û ji gelek dewletên Islamî çi Ereb û çi herêmkî û navdewletî, li gel berdewamiya hatina kesên (cîhadî) ji gelek welatên Ewrupî da ku ji karûbar û çalakiyên rêxistina Da'iş re bibin piştgir. Ta radeya ku ew rêxistina bû metirsiya herî bingehîn li ser hebûn û berjewendiya hemî miletan. Ji ber wê, tê xwastin ku hemî hewildan û kanînên hundurî, navçeyî û navdewletî kom ser hev bin, da ku ferebûna wê rêxistinê were dorpêçkirin û têkbirin..

Li alîkî din, civata fere destnîşan kir, ku çareseriyek leşkerî ji qeyrana[ezme] Sûriyê re ne gengaz e, û rêvebijartina baştir di şopandin û bikaranîna şêwe û hewildanên peydakirina çareseriyeke rêzanî û aştiyana di bin serpereştiyeke navdewletî de ye, daku herikandina xwînê û tarûmarkirin bisekine, û hêvî û daxwazên gelê Sûrî ji bo pêkanîna jiyaneke aram, azad û bi rûmet pêk werin. Ji bo pêkanîna vê yekê, tê xwastin ku hemî girse û hemarengên rikbera niştimanî ya ku partiya me jê beşeke jîndar e, kom ser hev bibin. Û li vir divê kiwalisyona (Îitîlaf) ku navnîşana herî navdar e ji rikberê re, berpirsyariya dîrokî hilgire, da ku rastgoya xwe li hundur Sûriyê li ser bingeha zelaliya di kar û nêrînan de diyar bike, û dûrî leşkerkirin û destêwerdaneke derveyî ku encama wê nexûyakirî ye, bixebite.

Di warê rewşa tevgera Kurd de li Sûriyê û êşekên ku herêmên Kurdî ji dorpêçkirin û êrîşin xwepînokî yên dubarekirî li ser destê Da'işê û xwîşkên wê dibînin, û ji bo pêdiviya gihana hev û yekrêziyê ji bo berevaniyê di vê serdema dijwar de, beşdaran li ser pêgiriya nehezhezokî bi naveroka lihevkirina Duhokê ya dîrokî ya ku di navbera Encûmena Niştîmanî ya Kurdî (ENKS) û Tevgera Civaka Demokratî (Tev Dem) di dîroka 22-10-2014 an de bi serpereştiya serokê herêma Kurdistanê birêz Mesûd Berzanî hatiye îmzekirin tekeze kir, û rola partiya me û sekretêrê wê ji bo amedekirina hevpeymanê û parastina serkeftina wê berçav dît, ewa levkirina ku bûye ciyê pîroziyê li ba hemî partî û hêzên Kurdistanî, di nav de perlemana herêmê, û Koma Civakên Kurdistanê (KCK) û herweha pir dost û hin rikberên Sûrî yên xwedî nêrînên demokrat jî.

Di çarçewa gengeşekirina rewşa ku ENKSê jê dinale û rûdawên ezîtî de, û nexweşiyên partîtî, sistbûn û pîvanên ne rast û kêm, civatê tekez kir ku biryara li vê dawiyê bi navê encûmenê ji bo dûrxistina partiya me û du partiyên din bi lez hat, ew ciyê mixabiniyê ye. Ji ber ku ew di vê serdema dijwar û nazik de û dûrî hestiyariya berpirsyariyê bû, û armanc û hewildana xwediyên ew biryara ne rast, belavkirina tewanbariyên ne durust bû, mebesta wê ew bp, ku rastgoya partiya me û rola wê ya erênî û naskirî li ba piraniya hêzên Kurdî û Kurdistanî têk bibe, û herweha di bingehê de jî hevpeymana Duhokê biseknînin û kend û keleman li pêş cêbicêkirina naveroka wê dînin.

Ji aliyekî din ve, civatê li ser girîngiya danûstandina erênî bi xweseriya heyî re û li gor naveroka hevpeymana Duhokê tekez kir, û pêwîst dît ku li ser bingeha hevpariya rasteqîn ji hilgirtina berpirsyariyan re û berevanî di ber de ji bo xizmetguzariya doz û hewcedariyên gel ên rojane û çarenûsî rabe, û ji bo tijîkirina valahiya karvedêrî û bikaranîna maf û erkê berevaniyê di ber asahî û aştiya herêmên Kurdî û pêkanîna lihevkirin û yekrêziyê li ser asta her gund, navçe û herêmekê de.

Di warê netewî û Kurdistanî û bergîriya li dijî terorê de, civatê razîbûna xwe …………… ⓫

**Carek din …. Dûmahîk**

Û ji ber wan dizanî ku dermanê êşa wan yekîtî ye, berî çend salekî, berpirsên wan dewletan ji bo parastina berjewendiyên gelên xwe, nakokiyên xwe dane hêlekê û li ser yek maseyê guftûgoyên yekîtiyê kirin û pêngavine giring di warên aborî, rêzanî û civakî de avêtin. Vêca eger pêwistiya wan dewletên serbixwe carekê bi yekîtiyê hebû, ma gelo ya me Kurdên belawela, bê dewlet û kêmrûmet çiqasî û çend caran pê heye?!.

Guhertinên mezin li cîhan û devera me rû didin, giring e em Kurd hişyar û zîrek bin, bi hûrbînî bûyeran bixwînin û şirove bikin, civaka xwe ji nakokî û tundûtûjiyê biparêzin, piraliya netewî, olî û rêzanî bipejirînin û çanda rêzgirtin û jihevhezkirinê, çanda mirovheziyê belav bikin, biweşînin û bê dudilî her em li ser rêya xebatê bo bidestxistina azadî, aştî û wekheviyê bi rê ve herin.

**Bozrewanên Gel!…… Dûmahîk**

Mirov ji xwe mat dimîne, û dipirse kanî dilsoziya ji girêbesta Duhokê re? Kê maf daye van bêjin em mezin in ? Ma tu hilbijartin hatine kirin û xwe nas kirin ku ew xwedî cemewer in?! wan vîna gel daye hêlekê û bi navê wî dipeyivin, ev kiryarên gelêrîtane (şe'bewî) ji ber wê nûneran ji xwe re diçîne, merc û keleman ji hev re datînin.

Tevî ku îro kar û kiryar çi ne, û em di rewşek awarte û demkî de ne, divê were pesendkirin û girêbesta Duhokê bête cîbicîkirin, ji ber ku îro tu rê û şivîl li ber me kurdan bilî lihevkirinê tunene, ta ku em ji hêla hemî hêzên cîhanî ve bi erênî hatine pesend û nas kirin. Ger em çiqas li ser hev bin, ewqasî emê berê wê ji xwe re jêkin.

Bila bizava me nebe hespê ku bûye mişk û di qulqa ezîtî û berjewendiya teng de winda nebe.

**Ragihandina ji civata fere …… Dûmahîk**

ji piştgiriya Kurdistanî û cîhanî bi xelkê me yê Kobaniyê re û rol û sekna pêşmerge û HPG bi Yekîneyên Parastina Gel (YPG, YPJ) re li dij ferebûna Da'iş kir, û êrîşên wê yên hovane -yên ku berê li dijî Kurdên Êzdî li çiyayê Şengalê bi wêneyên herî bed bi kar aniyekir, ta ku ew gihîşte asta kuştina giştî û şerê tunekirinê (Cînosayd) di dermafê pêkhateyekê ji nişteciyan Kurd re, kir.

Di çarçewa nirxandina siyaseta partiyê û nêrînên wê ji dema piştî kongirê heftan a Nîsana 2013 an, beşdaran razîbûna xwe ji helwestên partiyê û rastgo û rastiya nirxandinên wê (wek ku gelek bîneriya wê dikin) da xûyakirin. Lê li wê dem bi xwe de, û ji ber lawazbûn û xemsariya ku bi komîta rêvebir girtiye, civatê rexne li ser karûbarê wê tomar kir. Herweha beşdaran bi giştî dîtin, ku divê ev guherînên ku di rewşa asayî-siyasî de, ku li welêt çêdibin werin têghîştin. Û gereke rol û çalakiya partiyê were bê hêzkirin û berdewamkirin. Ji ber wê, kar û xebat bi hin bendên tozika partiyê hate rawestandin û hin pêşinyarên rêxistinî yên din – li gor rewşê – li şûnê hatin bicîkirin.

Civatê rûniştinên xwe bi serkeftî bi dawî kirin, hereweha li ser berepêşbûna bêdudilî ji bo kar û xebata di nav gel de – bi ser hemî kendên hene de – sekinî, û li ser berevaniya di ber dadmendiya doza netewî ya demokrat a gelê me de, û ji bo aştî, azadî û wekheviyê tekez kir.

**Serbilindî ji pakrewanên azadî û rûmetê re... Rêz û rûmet ji pakrewnên Kobaniyê re...**

**Efrîn 30/12/2014**


**Komîta Rêvebir a Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

***(( wergerandin ji Erebî: Memê Alan ))***

## Aguhdarî

Komîta rêvebiriya rojnama Newrozê ji nivîskar û rewşenbîrên Kurd hêvî dike ku têkliyên xwe pê re berdewam bikin û bi nivîseran rûpelên Newrozê zengîn bikin .

# Hevalê hêja Ebdirehman Hemadê ji nav me bar kir



Li roja 3-1-2015an hevalê me yê hêja Mamoste Ebdirehman Hemadê ji nişkav ve çavên xwe damrand û goça xwe bar kir.

Birayê me Ebdirehman li sala 1945an li gundê Çolaqa- Efrînê ji dayîk bûye. Xwendina xwe li gundê xwe û li bajarê Helebê bidest xist. Pişt re, ji navîna salên heftê ji sedsala bîstan, li dibistanên navça Efrînê û dibistana gundê xwe karê mamostetiyê kir û tê de serkeftî bû. Ji bere çalakiyên wî yên siyasî karbidestên sazûmanê xêr pê ne dikir, loma jî cihê karê wî vedighaustin, ta li dawiyê ew avête dibistanên gundên Rojhilata Helebê, û dibin zexta karbidestên dewletê de, wî jikarvekêşana xwe xwast, û bûye nêzîk deh salan li gundê xwe Çolaqa rûdinişt.



Mamoste Ebdirehman di karê mamosteyiya xwe de dilsoz bû, ji zanînê û fêrkirinê hez dikir, û ji bo fêrkirina zarokan xwe pir xemxar bû.

Di ber karê mamostetiyê re, birayê me Ebdirehman ji dawiya salên şêstî de ji sedsala bîstan, derbas nava rêzên partiyên tevgara siyasî ya Kurdî bû, di nava refên wê de û ji ber dilsozî û pabendiya wî bi doza gelê xwe re û baweriya hevalên wî bi xebat û sinciyên wî, wî di hemî astên rêxistinî de kar kir, û demeke baş bû endamê Komîta Navendî ya Partiya xwe (PYDKs) jî. Lê li van salên dawîn, û ji ber tendurustiya wî, û rewşine civakî yen taybet, ji serkirdayetiya partiyê dagerî. Lê digel wê, ew cihê rêz û rêzdariya hevalên xwe bû, û dilê wî jî herdem li ser doza gelê xwe û xebata partiya wî bû. Loma jî, dema ku nûçeya goçkirina wî belav bû, bi sedan dost û hevalên wî ji hemî deverên navaçê li mala wî civîn, û li roja /4.1.2015an/, bi dilekî xemgîn darebesta wî li ser destan birin nava goristana Gundê Çolaqa û li ba her du kurên xwe yên camêr, hate veşartin.

Li ser goar wî, hevalekî serkirdeya partiya wî (PYDKs) gotineke kurt kir, tê de rastiya sincî û xebata wî biha nirxand û serê mal, malbat, dost, heval û hezkiriyên wî xweş kir.

Em jî, bi navê Desteya Sernivîser a Newrozê, serê malbat hevalê xwe yê hêja Ebdirehman Hemadê û dost û hevalên wî xweş dikin. Û bila canê wan hemiyan xweş be.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**

Êmêla Newrozê:
Newroz@yek-dem.com